Bidestveanîna Mafên Netewî
Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal De

Hejmar: 174
05'ê Çileya Paşîn 2012
Buha: 150 Tûmen

# Agirî

## Peyama pîrozbahiyê a Sekreterê Giştî yê PDKÎ

Ez bi boneya bîranîna ji dayîkbûna hezretê Mesîh û destpêka sala 2012'a a Zayînî, pîrozbahiyê li hemû hevwelatiyên Mesîhî bi taybetî Mesîhiyên akinciyên Kurdistanê dikim. Hêvî dikim ku rojên cejn bi xweşî û aramî derbas bibin û sala nû sala tebayî, aşitî û bi hevre jiyana şaristaniyane a gişt pêkhateyên olî û netewî ên Îranê û deverê be, û hemû gelê maf pêpeskirî ji aliyê Komara Îslamî ve û yek ji wan xwîşk û birayên mesîhî bi xebata yekgitî li jêr destên azar û meynetên Komara Îslamî rizgar bibin.
Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê
**Sekreterê Giştî**
**Mistefa Hicrî**

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

**PDK Îranê komkujiya**
Şirnexê bi tundî şermezar kir
R: 2

**Lêborîna Navnetewî daxwaza**
lêkolînan derbarê komkujiya Şirnexê de kir
R: 5

**Îranê di salekê de 488**
kes îdam kirine
R: 5

# Gelo pirsa Kurd bi komkujiyên weha tê çareserkirin?!



Di şeva 28'ê Çiriya Paşîn de, 4 balafiren şer ên F-16 li nêzîk gundê Roboskî û Bêcuhê ser bi herêma Qilabana Şirnexê karwanek kasibkaran bombebaran kirin. Di bomberana balafirên şer de 35 kes bi awayê herî hovane hatin şehîdkirin. Ew kesane ku kasibkar bûn, dema di şevê de, ji aliyê sînorê Herêma Kurdistanê vedigeriyane gund, bûne amanca vê êrîşa balafirê ertêşa Turkiyê.

Piştî vê êrîşa hovane ya balafirên Ertêşa Turkiyê, gelê Kurd li her ciheke cîhanê ku lê dijîn, bi awayên curbicur dest bi meşên berfireh kirin û ew kiryara hovane bi tundî protesto kirin. Herweha gellek partî û kesayetiyên siyasî bi derkirina daxuyaniyan ew êrîş hovane binav kirin, û daxwaza lêkolîna li ser vê bûyerê ji aliyê dewleta Turkiyê ve kirin. PDK Îranê jî yek ji wan partiyan bû ku bi tundî ew êrîş şermezar kir, ku deqê daxuyaniya PDKÎ di rupela duyemîn de hatiye bi cih kirin.

## Yasaya tehrîmkirina Banka Navendî a Îranê hate îmzekirin

**Barak Obama serkomarê Amerîkayê yasaya nû ya budceya parastinê a DYA'ê îmze kiriye ku pêk hatiye ji tehrîmên bi dijî Îranê bi taybetî cezakirina şîrketan û wan nawendên ku bi banka navendî re danûsitandinan dikin.**

Ew yasaya destpêregihîştina şîrketên derekî ên



danûsitandinkar bi Banka Navendî a Îranê bi nîzama malî ya DYA'ê re qedexe dike û dahata neftî a Îranê dike emanc. Di yasaya budceya parastinê ya 662 mîlyard dolarî ya Amerîkayê de, ku meha Desamberê di parlementoya nûneran û Senayê de hate pejirandin, zêdetirkirina tehrîmên bi dijî Îranê jî cih girtiye, ku behs û gengeşeyek zaf li pey xwe re hebû da ku di yasayê de hate bi cih kirin.

Barak Obama ragehand ku îmzekirina vê yasayê nayê wateya qebûlkirina tewaya naweroka vê yasayê ji aliyê min ve. Heya niha barak Obama bi sedema nîgeraniya ji bandora nerênî ya tehrîman li ser nirxa nefta xaw û derbe ketina li aboriya cîhanî amade nebû ku Banka Navenî a Îranê tehrîm bike.

Piştî vê ku ew yasa hate pesend kirin Wezareta Karûbarê Derve a Amerîkayê ragehand ku tehrîmkirina banka navendî wê kêmtirîn bandora nerênî li ser DYA 'ê dê hebe.

**PDKÎ û Komelê di daxuyaniyekê de hilbijartinên parlementoyê baykot kirin**

Hemwelatiyên rêzdar!
Xelkê xebatkar yê Kurdistanê!...
R: 3



**SERHILDANA**
AGIRÎ

A: Mecîd Cinîkanlo

Komara Agirî anko Komara Araratê (1927-1931) yek ji dewletên ...
R: 8



**Beşdarên di şerê Ceterê de bas ji** destanrêsiyên pêşmergeyan dikin.

"Di despêkê de destxeşiyê dibêjme xebatkarên Rojnameya Agirî ku bona ...
R: 9




**Zimanê kurdî** mîrata bav û kalên me

Bêhzad Simko

Zimanê Kurdî nîşana hebûna netewa Kurd e, Xwedî derketin ji ziman tenê bi teorî...
R: 11

www.agiri-kurdi.org

Hejmar 174, 05'ê Çileya Paşîn 2012

# PDK Îranê Komkujiya Şirnexê bi tundî şermezar kir

Li gor nûçeyên ku belav bûne, demjimêr 10'ê şeva 28.12.2011'an, dehan kolber û kasibkarên gundê Rûboskî ser bi bajarê Şirnixê yê Kurdistana Turkiyê, ketin ber êrîşa hovane a balafirên bombe avêj ên rejîma Turkiyê û di encam de 35 kes ji kolberan canê xwe ji dest dan û çend kes jî birîndar bûn. Herweha pitir ji 15 kes jî heya niha bêser û şûn in.

Balafirên şerrker ên Turkiyê di demekê de ev tawana mezin encam dane ku kolberên wê deverê bi agehdarî û rizamendiya berpirsên Erteşa Turkiyhê mijûlî kar û kasibiyê bo bidestxistina bijîva jiyana xwe li ser sînoran di hat û çûyê de bûn û bi vî awayî canê wan jê hat sitandin.

Eva cara yekem nine ku hêzên Turkiye û Îranê, dûr ji hemû rê û şûnên mirovî, xelkê zehmetkêş yên Kurdistanê li ser sînoran dikin armanc û kasibkar û kolber dikevin ber êrîşa esmanî a balafirên Turkiyê û topxaneyê hêzên



rejîma Îranê û bi awayên herî hovane wan şehîd û birîndar dikin, û jiyana wan ji nav dibin û wan dikin goriyên siyaseta xwe ya qirêj, eva di demekê de ye ku ev rejîmên binpêkerên mafan bo xelkê berxwedanvan yên welatên din ku ketine ber pêla tepeserî û tun û tûjiya rejîmên xwe ên dîktator, bi berçav rondikên tîmsahî dirêjin û pêdagirîyê li ser mafên wan dikin. Di halekê de bixwe bi vî awayî Kurdan û xelkê parxwarî yê Kurdistanê û gelên din dikin armanc û bi hovanetirîn şêweyan kom bi kom wan şehîd dikin.

Em hevdem ku ev kiryara dijî mirovî a hêzên Turkiyê mehkûm dikin, û vê siyasetê bi berevajiya hewlên siyasî ên dostan û xêrxwazên riya çareseriya aşitiyane a pirsa Kurd di wî welatî de dizanin, û daxwazê ji kom û civatên mirovhez di asta navnetewî de dikin ku li hember wan tawanên nemirovane ên hêzên tepeserkar ên rejîmên Turkiye û Îranê bêdeng nemînin, û ji vê yekê pitir îzna wan rejîman nehê dayîn ku xelkê sivîl û zulimlêkirî yê Kurd bikin armanca leşkerî û hovane wan şehîd bikin.

PDK Îranê tevî nîşandana xem û kedera xwe ji vê bûyera dilêş, sersaxiyê dide malbat û kes û karên goriyên vê tawanê bi taybetî, û xelkê melbenda Şirnexê bi giştî, hêviya qenc bûn û şifaya her çiqas zû bo birîndarên vê bombebaranê dixwaze û piştrast e ku ew karên han, ne Kurdan ji nav dibin, ne jî pirsa Kurd çareser dike. Berevajî, xelkê Kurdistanê li ser daxwazên xwe micittir û pêdagirtir dike û di encam de riswayî û şermezarî bo wan rejîman dimîne ku mana xwe di tepeseriya netewa Kurd de dibînin.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**30'ê Çileya Pêşîn a 2011'an a Zayînî**
**9'ê Befranbara 1390'a Rojî**

## Sergotar

### Komkujî, diyariya sersalê

**Selîm Zencîrî**

Li davîn rojên sala 2011'an ku her kes mijûlê xemla xwe û xweşî û şadî û hêvîdariya bo sala nû bû, mixabin qederê pişt ji kurdan kir û rê da şevperestên hov ku li demek wuha hesas de xwe bikin mêvanê kurdan û li hember şadiyê de, şînî û kovanan bikin para wan. Şînek ku birînek kûr û xedar xist ser kezeba me.

Dewleta faşîstî a Turkiyê, du şevan berî sersalê cinayet û komkujiyek din li Kurdistana bakûr (gundê Roboskî a ser bi Qilebana Şirnaxê) encam dan ku dîmenên wê wijdana mirovahiyê dihejîne. Komkujiyek ku têde 35 kulîlkên nûgiha, 35 perperokên bêguneh, 35 kevokên aştiyê, 35 zarokên çavgeş û ciwanên pirr ji hêvî bi jiyanê hatin parçe parçe kirin û canemerg bûn.

Cinayetek ku hovêtiya sîstematîk a dewletên faşîst û dagîrker bi ser kurdistanê de dixîne bîra mirov ku li dirêjahiya dîrokê de derheq me de encam dane û hê jî karnameya reş a xwe bi xwîna kurdan dixemilînin. Wan rewşek ji bo kurdan anîne pêş ku heta zarokên kurd jî neçar bin bona bijîva jiyana xwe û malbatên xwe rû ji karên herî giran û dijwar bikin û li encam de jî bibin nêçîra bombe û napalmên dewletê û pêxor û aramiya nijadperestan.

Lê komkujiya han durûyî a siyseta Erdoxan derxist holê ku ji bo xapandin û bizwandina hesta xelkê li asta derekî de bi awayekê reftar dike û li navxwe de jî bi awayek din. Ew diçe zarokê Somaliyê tîne cem xwe û xwedî dike, şîretan li dîktatorên deverê dike ku mafê hevwelatiyan biparêzin!!, lê bi xwe jî zarokê kurdan dikuje û bi nîsbet kurdan li dewsa dîktatorên din de diherike. Erdoxan derheq kuştina 9 hevwelatiyên turk bi destê Îsraîlê hinde nema ku dunyayê jî xerab bike, lê her roj kurdan digre û dikuje qey tu dibêjî tiştek neqewimî ye.

Niha mirov nizane kîjan aliyê desthilata Turkiyê bawer bike? Gelo paketa demokrasiyê û vebûna demokratîk? Dana mafên kurdan? Îdeayên biratî û bihevrejiyanê? Yan jî girtin û komkujiya derheq kurdan? Piratîk û realîteya heyî li siyaseta Dewleta Turkiyê de tenê girtin, serkut û kumkujiyan nîşan dide û ger ew durûyî nebe, çiye? Ma biratî wiha ye? Ma çareserî bi bombeyan e?

Ger berevajî vê yekê ye bila êdî ne xwe bixapînin û ne jî xelkê, bila zend û baskan lê hildin û serbarê daxwaza lêborînê ji kurdan û malbatên goriyan, encamderan ceza, rê ji bo vekolînên navnetewî xweş û malbatên goriyan jî qerebû bike. Paşan jî bi micidî bikevin tedbîr û çareseriya pirsa kurd. Bi taybetî ku niha pirosesa amade kirina destûrek bingehîn li rojevê de ye, derfetek başe bona avêtina gavek yekcarî a dîrokî di arasteya çareseriyê de.

Nexa divê bizanibin ku kurd bi wan komkujî û cinayetan naqedin û vê berxwedana wan jî her berdewam û gurrtir be. Ji hêla din ve jî rewşa deverê aloz û bayê demokrasîxwaziyê jî rû ji deverê kiriye û hewce ye ku her kes xwe pêre hevaheng bike, nexa dûr yan nêzîk vê bikewe ber pêlên bihêze vê bahozê û ji nav biçe.

## Rê û resma sêyemîn kongireya Yekîtiya Xwendekarên Demokrat ên Kurditsana Îranê birêve çû

**Rê û resma bidawîhatina sêyemîn kongireya Yekîtiya Xwendekarên Demokrat ên Kurdistana Îranê kongireya "Geşeya Hizra Demokratîk" birêve çû.**

Li 2'ê Çileya Paşîn a 2012'an, bi beşdariya hejmarek li endamên rêberî ên PDK Îranê û endamên birêveberiya Yekîtiya Xwendekaran û kadr, pêşmerge û malbatên wan, rê û resma dawîhatina kongireya Yekîtiya Xwendekarên Demokrat ên Kurdistana Îranê birêve çû.

Destpêkê sirûda netewî a "Ey Reqîb" hat xwendin û piştre rapora bidawîhatina karê sêyemîn kongireya xwendekaran ji aliyê birêz Xalib Hebîbî, Endamê Desteya Birêveberî yê Yekîtiya Xwendekaran hat pêşkêşkirin.

Peyama Yekîtiya Navnetewî a Ciwanên Sosyalîst, bi boneya sêyemîn kongireya Yekîtiya Xwendekaran ji aliyê birêz Rêbwar Fanî ve hat xwendin.

Piştî pêşkêşkirina sitranekê ji aliyê hunermend Xulam Fatihî ve, birêz Serbest Urmiye Cihgirê Sekreterê Giştî yê Yekîtiya Xwendekaran sipasiya Partiya Demokrat û aliyên ku piştevanê kongireya han bûn kir.

Di beşek din a rê û resmê de, bi pêşkêş kirina lewhek rêzgirtinê xebata endamên berê ên birêveberî ên Yekîtiya Xwendekaran bilind hat nirxandin.

Dawîn beşa rê û resmê govend û dîlana Kurdî bû.



# PDKÎ û Komelê di daxuyaniyekê hevbeş de hilbijartinên parlementoyê baykot kirin

**Hemwelatiyên rêzdar!**
**Xelkê xebatkar yê Kurdistanê!**

Rejîma Komara Îslamiya Îranê ragehandiye ku li meha Reşemeya îsal de şanoya hilbijartinên gera nehemîn a Meclîsa Şêvra Îslamî birêve dibe, diyare heke hilbijartinek li welatek demokratîk û li jêr sîbera deshilateke bawermend bi demokrasî û maf û azadiyên xelkê de birêve here, bê guman encama wê dibe parlementoyeke gelî, û nûnerê rastîn ê xelkê. Her eva jî dibe sedema vê ku her takek civakê ji vê mafê xwe ê demokratîk mifahê bistînin û bi dilxweşiyek zaf ve ber bi sindûqên dengdanê ve herin, û ji vê riyê ve îrade û xwastekên xwe li parlementoyê û ji vê riyê ve jî li hikumetê de bidin cîbicî kirin. Lê gelo rastî eva ku rejîma Îranê li jêr navê hilbijartinan de şanosaziyan jêre dike û birêve dibe, xwediyê wan taybetmendiyan e ku me îşare pê kir?.

Komara Îslamiya Îranê rejîmek e ku li ser bingehek îdeolojîk hatiye avakirin, ku li nawerok û di çarçoveya wê de, ne tenê her mafê dengdana azad wek bingeha demokrasiyê jêre tu cihek çinine, belku bi tewahî bi hevre ne teba ne. Jiber ku deshilatdarên vê rejîmê xwe bi nûnerê xwedê li ser erdê dizanin, lewra li hemberî xelkê de xwe birsivder û berpirsyar nizanin, belku xwe wek biryarder û xelkê jî fermanber dihesibînin. Di vê şanosaziyê de heke em weha bihesibînin ku nûnerên rastîn ê xelkê jî bikarin ku herin parlementoyê, lê dîsan jî divêt ku emr û biryarên Weliyê Feqîh birêve bibin.

Di vir de ew pirsyar tê pêş ku gelo rejîm çima vê şanosaziyê birêve dibe. Di bersiva vê pirsê de divêt ku em bêjin rejîmê hewcehî bi vê hindê heye ku li hember bîr û raya giştî de weha nîşan bide ku pêgehek xelkî heye û hinek diyarokên deshilatek demokratîk berçav digre, lewra jî xelk li hilbijartinan de beşdariyê dikin, û rewayiya vê rejîmê pesend dikin. Di rastî de rejîmê hewcehî bi komkirina xelkê heye li ser sindûqên dengdanê, tenê bi armanca paropagendekirinê ji xwe re, ne ji bo beşdarkirina xelkê li birêvebirina welat de.

Her di vê çarçoveyê de ye ku rejîm li her binkeyek hilbijartinê de di navbera hijmarek zaf ji berbijaran de bi armanca pêkanîna pêşbirkêyan û anîna xelkê bo ser sindûqên dengdanê çend nûnerên dilxwaz ê xwe diyarî dike û ên din jî ji aliyê Şêvra nobedar ( Şorayê Nigehban) ve kêrhatîbûna wan tê retkirin. Xelk jî neçar dibin ku dengê xwe bidin wan berbijaran ku ji aliyê Şêvra nobedar ve hatine pesend kirin. Piştî vê jî rejîm li nav wan berbijaran de jî tenê kesên dilxwaz ê xwe ji sindûqan derdixe.

Ya cihê heyrîmanê ew e ku car heye berbijarek li dewreyekê de kêrhatîbûna wê tê qebûlkirin, lê di gerek din a hilbijartinê de her ew berbijar tê ret kirin. Bi vî awayî ên ku diçne parlementoyê, ne xelk wan wek nûnerên rastîn ê xwe dizanin, û ne jî ew li hemberî xwastek û daxwaziyên xelkê de xwe berpirs dizanin, belku bi kiryar biryar û rasipardeyên rejîmê cîbicî dikin, ji ber ku ew nûnerên deshilatê ne, ne nûnerê xelkê.

Bi vî awayî parlemento jî bi kiryar dibe binyateke rejîmê wek dem û dezgehên din ên rejîm, ku more û kesên fermanberê wan têde hatine cih dan.Heta heke yasayek jî di vê parlementoya fermayişî de hate pesend kirin, Şêvra nobedar gellek zû dest bi kar dibe û vê yasayê ret dike.

**Hemwelatiyên hêja!**

Rejîma Komara Îslamiya Îranê di rewşekê de vê şanosaziyê birêve dibe ku rejîm li her demekê zêdetir ketiye tengasiyê de. Hewlên terorîstî ên rejîmê di asta navdewletî de wek pîlana terorîstî ya balyozê Erebistana Seudî li Niyoyorkê, û protestokirina rejîmê ji aliyê rêkxirawa Mafê Mirovan a NY derheq binpêkirina mafê mirovan û rapora "IAEA" ku yekdengiyek tewaw di asta civatgeha navnetewî de pêk aniye, bona tundtir û bilez kirina cezayên navdewletî bo ser rejîmê, û di navxwe a welat de jî kirîza aborî, civakî û siyasî rejîm xistine tengasiyek bê qas de, û niha heta di nav baskê naskirî bi "usulgerayan" de jî li ser deshilata zêdetir valahiyek pirr mezin tê ketiye, û baweriya wan bi yektir nemaye.

Reformxwaz ku heya niha bilindgoya sereke a rejîmê bûn, û bona propagendekirin û rakêşana xelkê bo ser sinduqên dengdanê ji tewaya şanoyên hilbijartinê mifah werdigirtin, niha ji vê hilbijartinê ketine nav şik û gumanan, di vê rewşê de hewce ye ku jin, ciwan, kedkar, xwendekar, mamosta û bi giştî tewaya tex û qatên civaka Îranê di cihê alîkarî kirina bi rejîmê bona serkevtina vê şanosaziyê, bi yekdeng bona neçûna ser sindûqan, vê şanosaziyê bê bandor bikin, û bi vî awayî bi xelkê cîhanê ragehînin ku hikumeta Îslamiya Îranê rewayiya wê nemaye.

**Xelkê mafxwaz yê Kurdistanê û neteweyên bindest!**

Rejîma Komara Îslamiya Îranê dijminê sereke ê tewaya maf û azadiyên neteweyên Îranê ye û li heyamê salên pêşîn de siyaseta herî tund û tûj a ferq û cudahîdanînê û bê parkirinê li hember neteweyan birêve biriye.

Di vê heyamê de û her carê bi pîlanekê bi taybetî bi pêkanîna pêşbirkêyan di nav peyrewên olên cuda, û zarawayên cuda xelk li dewra sinduqan kom kiriye û ragehandiye ku beşdariya xelkê li dengdanê de nîşaneya razîbûna xelkê û rewayiya rejîmê ye. Bila vê carê bi yekdeng neteweyên hişyar ên Îranê wan pîlanan bikne bilqa ser avê û bi neçûna ser sinduqên dengdanê rejîma Îranê zêdetir ji her demek din şermezar bikin. Niha dema vê hindê hatiye ku hemwelatiyên bêzar ji rejîmê bi zanyarî û ezmunek zêdetir ji vê rejîmê û derbasbûyiya wê, bi deng nedana xwe rejîmê ceza bikin, û bi vî awayî erkên nîştimanî ên li ser milên xwe bi cî bigehînin.

PDKÎ Û Komeleya Şoreşvan a Zehmetkêşên Kurdistana Îranê hêvîdar in ku beşdarînekirina xelkê li şanosaziya hilbijartina vê carê ya parlementoyê de, bibe sdemek bihêz bo yekîtiya di navbera xelkê de, û herweha handerek bihêz be bo îradeya wan ya di warê hiloşandina rejîma Komara Îslamiya Îranê piştî hilbijartinê û avakirina hikumetek dilxwaz bo tewaya xelkê Îranê.

Komele û PDK Îranê bi berçavgirtina hemû wan rastiyan û hestkirina bi berpirsyariyan li hember dîrokê de li ser vê bawerê ne ku di demekê de ku çûna xelkê li ser sinduqên dengdanê tenê bi qazancê rejîmê bi dawî tê, û renge bîr û raya giştî ya cîhanê ji rê derxe, rewa nine ku xelkê azadîxwaz û bêparkirî ji maf û azadiyên wan bibne sedema cîbicîbûna pîlanên rejîmê ku tenê xelk têde derba herî dijwar lê dikeve û zirarê dibîne.

Lewra hewce ye ku bi neçûna ser sinduqên dengdanê bi bîrûraya giştî a cîhan bidin xuyakirin ku piraniya xelkê Îranê bi giştî, û xortên neteweya Kurd li Kurdistana Îranê bi taybetî ji vê rejîmê bêzar in, û mana rejîmê ew jî rejîmek xwedî çeka navikî bi gefek mezin bo ser xwe û xelkê welatên derdorê dizanin.

Bila ew hilbijartin bibe derfetek din ji bo nîşandana nerizayetî û bêzariya xelkê ji vê rejîmê, ew jî bi neçûna bo ser sinduqên dengdanê, û bi vî awayî rejîmê di vê şanosaziyê de bi şikesteke mezin re berbirû bikin.

Serkevtin ji xebata yekgirtî ya xelkê Îranê, dijî rejîma tepeserkar ya Komara Îslamiya Îranê

**Partiya demokrat a Kurdistana Îranê**

**Komeleya Şoreşgêr a Zehmetkêşên Kurdistana Îranê**
**26.12.2011**
**05.10.1390**



# Vê care şer di navbera Xamineyî û Ehmedînijad de ye

Komara Îslamî di demekê de navnivîsa berendamên şanosaziya gera nehê ya Meclîsa Şoraya Îslamî a Îranê, dest pê kir ku hemû rexnegir û aliyên ku gazinde ji şêweya birêveberiya welat digrin ragihandine ku tu baweriya wan bi hilbijartinê nîne û beşdariya wê şanosaziyê nakin.

Ji wê beşa opozisyona deselatdaran ku di bingeha xwe de girêdaiyê sîstema Komarî Îslamî ne bi der, ji destpêka jiyana Komara Îslamî ve heya niha opozisyona guhertinxwaz tu gav bawerî bi hilbijartinên bin siya rêjîmê nebûye. Lewma her ji hilbijartina gera 2'ê ya Meclîsê û pê ve tu gav beşadariya hilbijartinan nekiriye û pir caran jî bi awayê çalak daxwaz ji xelkê kiriye ku xwe ji şanosaziyên rêjîmê bi dûr bigrin.

Bi nebûna opozisyonê û paşve kişiyana rexnegirên hundir, Komara Îslamî ber bi hilbijartinekê ve diçe ku ji niha ve encama wê tê texmîn kirin. Lê dîsan jî karbidestên hilbijartinê û derdorên nêzîkî Elî Xameneyî ji encamên îhtimaliye derveyî îradeya xwe dudil in û bi her rengî hewl didin ku kontrola hemû datayên hilbijartinê bigirne destê xwe. Armanca wan ew e ku Meclîsa 9'ê bi yekcarî bibe ciyê kombûna kesayetiyên bi tewayî girêdayî rêbaza mutleq a Xameneyî.

Pêşbirkêya sereke, weke di dezgehên ragehandina rêjîmê de tê xuya kirin, di navbera du aliyên tundrew û tundrewtir



**Ebdulla Hicab**

yên girêdayî bi sîstema Wilayeta Feqîh de ye. Niha ji ber tengbîriya ku sîstem bi ser alîgirên xwe de ferz dike, ev du alî jî li hev nakin. Muhafizekarên tundrew ku bi xwe ji 2 desteyan pêk tên û di bin serkêşiya Muhemed Riza Mehdewî Kenî û Muhemed Teqî Misbahê Yezdî de ne bi biryarin ku Ehmedînijad bi awayekê dorpêç bikin ku nekare li derveyî îradeya wan tu karekê bike.

Ev, derdorên Ehmedînijad bi durû dihesibînin û li ser wê baweriyê ne ku ew ji rêbaza Xameneyî dûr ketine. Lê çembera nêzîk Ehmedînijad wê pilanê di bin serê Refsencanî de dibîne ku ji ber destpîsiya abûrî û ji tirsa eşkerebûna gendeliyên xwe her carê bi awayekê û bi fraksyonekê re li hember hukûmetê disekine.

Bi kurtî tu karbidestên rêjîmê bawerî bi yên dî nînin û her yek ji wan bi awayekê dixwaze xwe bi cemserekê ve girê bide heya cî û pileya xwe biparêze. Ji ber wê ye ku niha her çend hemû reqîbên serekeye xwe li gorepana hilbijartinê dûr xistine, dîsan jî ne bawer in ku bikaribin meclîsek li gor dilê xwe ji sandûqên hilbijartinê derxin. Hemû jî haydarin ku baweriya tu kesî bi wê lîstika wan nayê û êdî ji xelkê Îranê re ne giringe ka kî diçe Meclîsa nehê.

Li derveyî bigir - bikêşa nav damudezgehên rêjîmê, heya niha hilbijartinên Meclîsê bi çavek cuda dihatin temaşe kirin. Li Kurdistan û herêmên derveyî bazneya deselatê, hilbijartinên ji bo Meclîsê carna dibûne qadek ji bo ku pirsgirêkên herêman bikevin rojeva siyasî. Lewma di gel bandora xurte opozisyona Kurd li ser civaka Kurdistanê û bêbaweriya xelkê bi sîstemê, hin car rêjeyek berçav ji xelkê beşdarî hilbijartinên ku rêjîmê pêk dianîn dibûn, tenê ji bo ku nîşan bidin daxwaziyên wan ji rojeva rêjîmê cuda ne.

Lê niha nayê texmîn kirin ku şanosaziya wê carê rê bide ku derfetek wisan bikeve destê xelkê, lewma tê payîn ku gelê Kurd û gelên dine derveyî bazneya deselatê hê pitir xwe ji şanosaziya nû ya rêjîmê bi dûr bigrin.

Di şanosaziya li pêş de çi koma girêdayî bi pîre ayetullahên tundrew bi ser dikeve, çi tundrewên girêdayî Ehmedînijad û bazneya dora wî, wê Meclîsa 9'ê yek ji meclîsên herî lawaze rêjîma Komara Îslamî be. Ji ber ku beriya pêvajoya hilbijartinê tu derfet neman ku kesayetî an aliyên hinek dûr ji her du fraksyonên tundrew ên nav deselatê bikevin pêvajoya hilbijartinê.

Aliyê erênî ku dikare li encama wê pêvajoyê derkeve, hilverîna beşek din ji sîstemê û dûrketina komelek nû ji çalakvanên siyasî ji rêjîmê ye. Wê carê opozisyonê helwêstek bi biryar li hember şanosaziya hilbijartina Parlemanê girt û beşdarî kirin di hilbijartinê de weke pêgavek bê fayde û bê bandor zanî.

Guhertinxwazên navxweyî, ji derudorên girêdayî Mûsewî, Kerûbî û Xatemî ve bigre heya girtiyên siyasî, kesayetiyên lîberal û siyasetvanên serbixwe jî hemû hatine ser wê baweriyê ku Komara Îslamî hemû deriyên hilbijartin û dengvedana dengê gel girtine û rê nade, heta di çarçoveya sîstemê de jî, kesên wisan herin Meclîsê ku daxwaz û hêviyên xelkê bînin ziman. Bi wî rengî hevdengiyek pilan nekirî li navbera opozisyonê û tevgera guhertinxwaze navxweyî welat çê bû ku di dema pêşîn de wê bandorê li ser rewşa siyasiyê Îranê danê.

Rêjîm her çi qas zext û serkutkirinê zêde bike, wê di dema pêşiya me de nekare pêşiya daxwaza guhertinên bingehîn li navxweyî welat bigre. Îran ber bi duriyaneya hilbijartinê ve diçe, lê ev hilbijartin ne şanosaziya hilbijartina Meclîs an şanosaziyên bi wî rengî di çarçoveya sîstemê de ye.

Hilbijartina sereke renge pir nêzîk nebe, lê bêguman wê hilbijartina di navbera dîktatorî û vekirina siyasî de be. Di hilbijartinek bi wî rengî de êdî tu rola Xameneyî, Ehmedînijad, Weliyê Feqîh û Muhafezekaran namîne.

Nîşaneyên wê pêvajoyê ji niha ve di helwêst û daxuyaniyên karbidestên Komara Îslamî û berpirsyarên hilbijartinê de xuya dikin. Di gel ku ew dizanin di hilbijartina Meclîsê de dijber an aliyê opozisyonê nîne û ji ber wê yekê jî xebata hilbijartinê wê li gor pilana wan bimeşe, lê dîsan jî ji encamên neyên çaverê kirin ditirsin. Ji ber wê ye ku hilbijartina li pêşiya xwe weke yek ji ezmûnên here mezine jiyana xwe ya 32 sale dihesibînin.

Ew nêzîkbûn dikare bi xwe re rewşekê bixoliqîne ku rê ji ber girtin û serkutkirinên zêdetir veke û dema piştî hilbijartinê bike serdemek nû ya zext û serkutkirinê. Lê rêjîm jî dizane ku dema wê carê çexmaqê serhildanan vê ket, êdî rojên fînalê wê nêzîk bin.

# Vê carê Sarkozî Erdoxan nîgeran kir!



Şehab Xalidî

Li gorî çavkaniyan di sala 1915'an de bi du sedeman Ermenî ji aliyê Împeratoriya wê demê ya Osmanî ve hatin komkujkirin. Ya yekemîn bi vê sedemê ku Ermenî wek dîwareh hesinîn ketibûn navbera Turkên Osmanî û Panturkzimanên Qefqazê ku ketibûna aliyê din ê Behra Xezerê, ku bi tu awayî di warê toxmî ve Ermenî û Turk nêzî hevudin nebûn. Ya duyemîn ew bû ku ew ERMENÎ Mesîhî bûn û serbarê tewaya zextên li ser wan bona goherîma mesebê xwe ew amade nebûn ku mesebê xwe biguherin û bibne Musilman, lewra jinavbirina Ermeniyan ji aliyê pan turkîsmên Osmanî ve gellek hewce dihate zanîn.

Lê li gorî hinek çavkaniyan jî hem di nivîsandina serjimêriya durut ya kuştara Ermeniyan de zêderewî hatiye kirin, û hem ji sedema durust û mentiqî ya kuştra Ermeniyan nehatiye baskirin yan nivîsandin. Li gorî wan çavkaniyan kuştara Ermeniyan piştî kuştara Azeriyên li bakura rojawayê Îranê û Azeriyên Azerbaycana Sovyetê ji aliyê Ermeniyan ve dest pêkir ku destê Sovetê li handana Ermeniyan bi dijî Azeriyan de hebû.

Lê ew kuştar bi her sedemekê ve be, bûyerek tal di dîroka Turkiyê de ye ku nabe were înkar kirin. Bi xweşî ve niha li Turkiyê de hinek kesayetî û binyat hene ku kuştara Ermeniyan wek cînosayd binav dikin, ku yek ji wan Binyata Mafê Mirovan ya Îstenbolê ye ku dibêje kuştara Ermeniyan jînosayd e. Herweha di sala 2008'an de bû ku hinek ji mamostayên Turk ên zanîngehên Turkiyê kuştara Ermeniya wek nivşkujî binav kirin û seba vê komkujiyê daxwaza lêborînê ji Ermeniyan kirin, ku wan bi vê kiryarê karîbûn xeta sor li Turkiyê de derbaz bikin. Herweha heya niha 20 welatan ew kuştar wek jînosaydê binav kirine.

Di rastî de ew pirs ne pirsek nû ye, û vê carê jî ew pirs piştî çûna Sarkozî bo Ermenistanê û şandina piroje yasayekê (layeheyekê) bo Parlementoya Feransê derheq cezakirina ên ku kuştara





Ermeniyan ret û înkar dikin, kete ber bas, û car din bandor li têkiliyên di navbera Feranse û Turkiyê kir.

Dewleta Turkiyê bi serokatiya Erdoxan helwestek tund li hember vê kiryara Sarkozî de girtiye pêş, û daxwaz ji Feransayê kiriye ku eva Feranse ye ku dibe seba komkujî û wan cînayetên ku li Elcezayir û ...hwd encam dane, daxwaza lêborînê bike.

Turkiye herweha li ser vê bawerê ye ku şandina proje yasayek bi vî awayî bo senaya Feransê ji aliyê Sarkozî ve hem zindîkirina şerê di navbera Misilmanan û Eremeniyan de ye, û hem jî propagendeyek siyasî ye, lê bi baldan bi vê ku nûnerên tewaya partiyan di Senaya Feransê de dijî Turkiyê dengê xwe danê vê proje yasayê, ew boçûn lawaz e.

Niha yek ji şertên qebûlkirina endametiya Turkiyê di YE'ê de qebûlkirina rastiya komkujiya Ermeniyan û pirotestokirina vê komkujiyê ye, lewra di demekê de ku Turkiyê gellek hewil daye ku bibe endam li YE de, ji bo deshilatdarên Turkiyê anîne ber basa vê pirsê cihê nîgeraniyê ye.

Lê seba vê ku Turkiyê serbarê vê kirîza aborî ya cîhanî û bi taybetî ya ku li nav welatên endam di YE de pêk hatiye, ji wan kirîzan tu derbên malî û aborî nexwarine, û ji aliyek din ve, jiber ku riya sereke û stratejîk ya derebaskirina enirjiyê bo Ewropayê ji Turkiyê re derbas dibe, lewra Turkiyê hem xwe bê minet ji Feranse û Yekîtiya Ewrupayê nîşan didin, û hem jî gefên dîplomatîk ji wan dikin.

Lê li hember de, serbarê vê ku Labiya Ermeniyan li Feransê de pirr bihêz e û kariye Feransê neçar bi anîne berbasê ya mijarek bi vî rengî bike, Feranse û heta welatên Rojawayî jî dixwazin ku pirsa komkujiya Ermeniyan û heta pirsa Kurd jî wek karteke zext û givaştinê bi dijî Turkiyê bi kar bînin da ku Turkiyê ne bi helwestek xwedîhêz, belkû bi helwest lawaz di gel YE'ê bikeve nav gotûbêjan de.

Herçend ew pirs ne pirsek nû ye, û her carê bi awayekê dikeve rojevê, û li serdemê deshilatdariya Robêrt Koçaryan serkomarê pêşîn ê Ermenistanê û herweha serkomarê niha yê vî welatî de jî pirsa komkujiya Ermeniyan ketibû ber bas, lê niha ku înkara vê komkujiyê aliyê hiqûqî bixwe ve digre, Renge Turkiyê jî êdî tirs ji vê hindê hebe ku pirsa komkujiyê, wan bikêşe nav dadgehên navnetewî de, û heta şerek jeopolîtîkî di navbera wan û Ermenistanê de li ser wan erdên ku Ermenî îdia dikin ên wan in, dest pê bike.

Helbet nabe em ji bîr bikin ku heyamek berî niha pirsa qebûlkirina komkujiya Dersîmê jî bibû pirsek germ ya di parlementoya Turkiyê de, ku di dawiyê de Erdoxan li ser navê dewletê daxwaza lêborînê ji Dêrsîmiyan xwast.

Ew lêborîna navbirî ji dîtingehên cud cuda ve hate şirove kirin, lê gellek ji kesayetiyên siyasî li ser vê bawerê bûn ku ew lêborîn jî lêborînek siyasî ye bi armanca dijberî kirina bi CHP'ê re, ku li Dersîmê de dengê yekemîn di hilbijartinan de anîbû.

Lewra dewleta Turkiyê bona vê ku biselimîne ku ew lêborîn ne siyasî bûye, belku wan di warê însanî de ew komkujî şermezar kiriye, hewce ye ku hesta mirovdostiya deshilatdarên dewleta Turkiyê bi ser hesta panturkîsmê de zal be, û vê rastiya komkujiya Ermeniyan wek rastiyek tal ya dîrokî bi dûr ji her armancek siyasî qebûl û bi tundî şermezar bikin. Jiber ku yên komkijiyan şermezar û rexne nekin renge rojekê biwe jî komkujiyan biafirînin.

# Îranê di salekê de 488 kes îdam kirine

Li gorî daxuyaniya Rêxistina Efûya Navneteweyî, rêjîma Îranê îsal li Îranê ji ber sucên hişberiyê 488 kes hatine îdam kirin.



Rêxistina Efûya Navneteweyî bal kişand ser hijmara kesên ji bo rêxistinî têne îdam kirin, li gorî salên din îsal 3'ê qat zêdetir bûye. Her wiha rêxistinê nîşankir ku li seranser cîhanê herî zêde îdamkirin li Îranê dibin û sal ji sala din îdamkirin zêdetir dibin.

## Lêborîna Navnetewî daxwaza lêkolînan derbarê komkujiya Şirnexê de kir

**Rêkxirawa lêborîna navnetewî daxwaz ji dewleta Turkiyê kiriye ku derbarê komkujiya 35 hemwelatiyên Kurd di Turkiyê de lêkolînên hûr encam bide.**

Nîkolas Dakurd birêveberê programên Ewrupa û Asiyaya Navîn li rêxirawa Lêborîna Navnetewî tevî pêdagiriya li ser daxwaza lêborînê ji malbatên qurbaniyan ji aliyê dewleta Turkiyê ve ragihandiye: Rûdawên bi vî awayî û komkujiya xelkê sivîl hewcehî bi lêkolînên zêdetir e.

Li gorî raporên bilavbûyî ji aliyê rêxirawa Lêborîna Navdewletî ve li encama êrîşa balafirên şerker ên hêza esmanî a erteşa Turkiyê bo ser komek ji xelkê medenî di gundekê li ser sînorê bajarê Şirnexê ê Kurdistana Turkiyê, 35 hemwelatiyên Kurd hatin kuştin.



www.arsivakurd.org

# Derbek dijwar li cesteyê hevalbendiyek têkder



Ew bûyerên bê sabiqe yên ku di vê sala dawiyê de, li herêma Rojhilata Navîn û bakûra Afrîqayê de rû dan, wek bahozek pirr bihêz bû ku hêlûna êmin û sunnetî ya dîktatoran bi serîhildana xelkî û guherînkariyên bingehn re ber bi rû kir.

Mirov bi heq dikare bêje ku sala 2011'an xalek pirr girîng ya guherînkariyan di vê herêmê de bû. Herweha li gorî pêgeha xwe a jeopolîtîk, ew herêma wek qada siyaset û aboriya navnetewî, û herweha wek salek çarenûssaz li pêkhateya siyasî ya navnetewî û lihevhatinên nû ên pêşerojê de bû. Wan serîhildanên pêkhateşikên, li vê herêmê, di navbera salekê de kariye gellek ji berhevdan û hevkêşeyên siyasî û stratejîk serûbin bike û pêşeroja hinek ji wan lihevhatinan û şerên sunnetî û kevnar ên di herêm û heta cîhanê de, bi aloziyên bingehîn re berbirû bike.

Di vê navberê de renge mirov bikare bêje ew erdheja siyasî ya mezin ku di nav rêzên hevalbendan û neyarên Îsraîlê de rû dan, ji guhertinên herî sereke bûn ku rasterast bandor li ser çarenûs û pêşeroja siyasî ya Îranê û rejîma Îranê kirine, û serbarê druşmên rejîmê di warê zêdebûna mînakên deshilata wan di herêmê de, wan guhertinan nîgeraniyên zaf berbirûyê siyaseta derekî ya wan kiriye, ku heta li navxwe a deshilatê de jî hinek hene ku wan guherînan wek gefek micid bo ser ewlehî û heta siyasetên stratijîk ên xwe dihesibînin.

Axavtinên Şêxolislam balyozê pêşîn ê rejîma Îranê li Sûriyê, di vî warî de ku



**Selam Îsmayîlpûr**

parastina rejîma Beşar Esed bi her nirxekê ji wan re hewce ye, nîşaneya wê ye ku hevalbendiya stratejîk a Îranê bi Sûriye û girupa Hizbullaha Lubnan û girupên naskirî bi Cîhadî ên Felestînê re, ne hevalbendiyek asayî, belku wek organîsmek wahîd e, ku pêkhatina her cure valatî û hiloşînekê li beşek ji wê de, gefek pêkhateyî bo ser tewahiya vê hevalbendiyê tê hesibandin.

Di vê navberê de serîhildana xwînîn û geş ya xelkê Sûriyê bi dijî rejîma Beşar Esed ku pevgirêka navîn û sitûna feqerata vê hevalbendiya stratejîk tê hisabê, tewahiya vê organa xirapkar, sist û lerzok kiriye, û beşên curbicur ên wê neçar kiriye da ku bikeve nava hewildanan de bona vê ku li nav wan hevkêşeyên siyasî ên herêmî de bikarin xwe ji jinavçûnê biparêzin.

Rejîma Îranê wek çavkaniya terorîsmê û binajoyiyê ku ji vê hevalbendiyê wek dîwarekê bi dijî dijminan û neyarên xwe li herêm û cîhanê de mifahê werdigre, û zêdetir ji her aliyek din xwe zirargihîştî dibîne, neçar bûye ku vebijêrka helatina ber bi aliyek bi tehluke ji xwe re hilbijêre. Lewra tewaya hewla xwe xistiye kar da ku dezgehên tepeserkar bihêz bike û pişetevaniya siyasî, aborî, leşkerî û dîplomatîk jê bike, ku ew siyaseta wan bûye sedema vê ku xelkê serhildêr ê Sûriyê neçar bin ku diruşman bi dijî deshilatdarên rejîma Îranê bidin û heta alaya rejîma Îranê jî bişewitînin.

Li aliyê din jî Hesen Nesrullah sekreterê giştî ê saziya Hizbullaha Lubnan helwestek wek hevalbendên xwe li Tehran û Dîmeşqê girtiye, û pêşeroja xwe bi çarenûsa her du rejîmên Îran û Sûriyê ve girê daye, û dest bi êrîşên devikî û herweha gefên şerxwazane kiriye. Ew yek jî tê vê wateyê ku Hizbullah jî jinavçûna rejîma Beşar Esed bi wateya qutbûna têkiliyên xwe bi cîhana derve û bi taybetî rejîma Îranê re dizane, û bi başî ji vê tengasiya jeopolîtîk agehdar e ku bi hiloşîna rejîma Beşar Esed wê berbirûyê wan be.

Aliyê din yê vê berhevdanê, Hemas û Cîhada Îslamî ne ku li kertê Xeze de cihgir in, û li jêr dorpêça hemû alî ya bejahî, behrî û esmaniya Îsraîlê de ne. Hemas bi sedema vê ku binke û endamên rêberiya wan li Sûriyê de ne, heya niha jî derheq pirsa Felestînê li gorî siyasetên Sûriye û Îranê kar kiriye û heya niha jî berevajiya girupa rikeberê xwe, wate tevgera Feth ku ji aliyê rojawa û dewletên Erebî ve tê piştevanîkirin, di rastî de wek beşek ji sitratejiya berfireh ya siyaseta derekî ya xeta Tehran-Dîmeşqê kar kirine, û ew yek li kertê Xeze de bi zirara wan bidawî bûye.

Lê di wan salên dawiyê de, weha diyare ku wan girupan hinek pêdaçûn bi ser siyasetên xwe de kirine. Hiloşîna rejîma Husnî Mubark li Mîsrê de wek hevalbendê sitratejîk ê Îsraîlê jî karî ku deriyê nû bi rûyê Hemasê veke, û Mîsrê vegerîne ser riya sunnetiya xwe, wate rikeberî û dijberiya bi Îsraîlê re.

Bi awayekê ku dema pevçûn di navbera pasewanên sînorî ên Mîsr û Îsraîlê de rû da, û derbazoka di navbera Mîsr û kertê Xezê de hate vekirin, mizgîniya jidayîkbûna Mîsreke nû û vegeryana Hemasê bo himbêza rikeberek nû bi Îranê hate dan.

Serhildana xelkê Sûriyê şokek din bû ku seranên Hemasê ji domandina pêwendiyên sunnetî bi xeta Tehran û Dîmeşqê re agehdar kir. Ji vê demê pêde ku di civîna bi nav Hişyariya Îslamî li Tehranê de, Xalid Meşel serokê Deftera Siyasî ya Hemasê bi awayek bê mînak tevî rêzgirtina ji Mehmûd Ebas serokê Rêkxistina Xwebirêveber ya Felestînê, axavtinên Xamineyî di vê civînê de ret kir, heta azadiya Gîlad Şalît leşkerê Îsraîlî ji girtîgeha Hemasê û guherîna wî bi dîlên Îsraîlî re, û civîna aştiyê ya Feth û Hemasê li Qahîreyê de demek zêde nekêşa.

Dawî guhertin di vê warî de gotin û axavtinên hinek ji rêberên Hemasê li pêwendî tevî hewcehiya veguhastina binke û nivîsîngehên vê girupê ji Sûriyê ve ber bi Turkiyê, yan jî welatek Erebî di dema hiloşîna rejîma Beşar Esed de bû, û heke ew rejîm hiloşe bê guman wê dawî helqeya pêwendiya wê girupê bi rejîma Tehranê re qut be. Ew jî tê wateya vê yekê ku rejîma Îranê, dê yek ji kartên xwe ên zextê li hemberî Amerîka û Îsraîlê de wê bidorîne.

Di ratsî de niha rejîm ku pêşeroja pêwendiyên xwe bi Hemasê re tarî dibîne, ketiye nav hewildanan de ku bi piştevanîkirina girupên biçuk wek Cîhada Îslamî û ... li kertê Xeze de, wan bi dijî Îsraîlê tûj bike û piyê Hemasê bixe nav şerê bi dijî Îsraîlê de, û bi vî awayî pêşiya ketina Hemasê bo nav himbêza rikeberên herêmî û lihevhatina tevî Feth û Îsraîlê bigre. Lê weha diyare ku bi baldan bi guhertinên di herêmê de, û zêdebûna rolê lîstikvanên wek Erebistan, Mîsr û Turkiye li herêmê de, rejîma Tehranê bikare di vî warî de serkevtinekê bi dest bixe.

www.arsivakurdi.org

# Rejîma Îranê Kurdistanê mîlîtarîzetir dike



Dara Natiq

Îro di demekê de ku teknolojî geşe dike û cîhana ragehandinê û torên pêwendiyên bilez li nav pirosesa bi cîhanîbûnê de geşeyek berçav bi xwe ve dibîne, berfirehtirbûna pêla mezin ya zanyarî û guherînkariyên civakî û çandî li asta herêm û cîhanê de mezintirîn guherînkarî û werçerxan li bestêna dîrokî ya mirovahiyê de derxistiye holê. Jiyar û temedon li ser bingeha demokrasî û pirensîpên demokratîk tên ava kirin, û demokrasî wek sîstema herî îdeal û modern ya siyasî û civakî ya hezareya sêyemîn tê hesibandin.

Ciwanên Kurd jî ji riya emrazên ragehandinên giştî ve dengê xwe tevî cîhana nû û guherînkariyan tevlî yektir dikin, û bi mifahgwergirtina ji metoda xebatê ya serdemyane, di pêxema gihîştina bi azadî û dabînkirina xwestek û daxwaziyên siyasî û civakî tevgera xwe ya mafxwazane ber bi pêşve dibin.

Lê mixabin rejîm li doma tepeserî û emniyetî kirina rewş û hewayê welat bi giştî û Kurdistanê bi btaybetî li warê sîxorî û bikaranîna teknolojiya agehdarî û pêwendiyên "ICT" ve bi alîkariya şîrketên Almanî, Çînî û kureyî bi awayekê xwe teyar kiriye ku dikare tewaya pêwendiyên xelkê kontrol bike. Ji bilî çavedêrîkirin û kontrola torên civakî ê înternetê wek facebook û tweteer,mobayl,peyam û wêneyan, rijîm bi destêwerdana di nav posta elekteronî ya îmêyl û bi taybetî sîstema pêwendiyên bi xorayî yaê paltak, skayp û ...hwd tev pêwendiyên xelkê kontrol dike.

Qedexe kirin û komkirina hercure emrazek zanyariyan bı taybetî mahware ku dibe sedema jêhelçûna asta zanyariya civatgehê, siyaseta vê dawiyê a rejîmê ye ku bi awayek berfirehli gund û bajarên Kurdistanê vê siyasetê piraktîze dike, bi awayekî ku tenê li parêzgeha Urmiyê de li heyamê mehekê de nêzîk bi sê hezar wesayil û emrazên setelaytan dest bi ser de hatiye girtin. Daxistina binkeyên edebî û rewşenbîrî û rêkxirawên medenî û herweha daxistina bilavokên Kurdî, girtin û destbiser kirina rojnamevanan, çalakên medenî, girtin, îşkence û îdamkirina lawên Kurd bi bi hêcetên curbicur li heyamê rabihurî de roj bi rojê zêde bûye, û rewş û hewayek tewaw ermniyetî per û baskê xwe bi ser welat de kêşaye.

Lê serbarê tepeseriyaxelkê azadîxwaz ê Kurdistanêbi taybetî ciwanên welat, û polîsîkirina rewşa Kurdistanê ji aliyê hêzên tepeaserkar ên rejîma Îranê ve, ew tevgera ku lawên welat dest pê kirine her roj xwestek û daxwaziyên xwe radîkaltir dikin, û berfirehtir dibe, û her cure hewildanek rejîmê bona asîmîlekirina şûnwarên netewî û çandî ên gelê Kurd û jinav birina vê tevgera azadîxwaz bi îradeya polayîn a xortên Kurd heya niha bê encam maye.



Rojev

# Gelo rejîma Beşar Esed wê bê hiloşandin?!

N: Michael Ledeen

W: Rêbwar Fanî

**Rêbwar Fanî**

Gelo çi fakter dikarin rewşê bona hiloşandina dîktatoran xweş bikin? Di rastî de bersivdana bi pirsek weha pirr zehmet e û sedema wê jî vedgire bo gellek hokaran, ku dibe sedem mirov nekare bi durustî tev aliyên vê mijarê şiroveb bike. Kudetayên cur bi cur û teror, şoreş, têkşikanên di şer de, û heta rûxanên çavnihêr nekirî, mirov dikare hemiyan li deqên bastanî û îroyîn de jî bibîne.

Yên ku rûxana dîktatoran pêşdîtin kirine, bo mînak derbarê hiloşîna Şorewiya Pêşîn, di rastî de bixwe jî ji bûyerek bi vî awayî ecêbgirtî mane. Ku weha bû hewce ye ku bo dîktatorên cur bi cur, pirsên taybet bi wan werin kirin û li gorî fakt û belgeyên ku nêzî wan dîktatoran in, ew pirs were lêkolînkirin.

Ya ku mirov dikare ji dîrokê hîn bibe, ew e ku hinek ji dîktatoran li rewşên pirr dijwar û aloz de, tên hiloşandin, û ew yek jî di demekê de ye ku hinek deshilat hene ku rewşa aloz dibe sedema zêdetir mana deshilata wan. ku weha bû li bersiva bi vê pirsê de hewce ye ku em bêjin ku em bi çi dîktatoran re ber bi rû ne.

Pirs ew nine ku çi hokar dikarin bibin sedema hiloşîna dîktatoran, belku pirs ew e ku gelo heya çi qasekî, dîktatorek îhtimal heye li ser deshilatê nemnîne. Di vî warî de hewce ye ku taybetmendiya wan dîktatoran berçav bihê girtin. Gelo kê pêşdîtin dikir ku Qezafî heya mirinê jî berxwe bide? Kî pêşdîtin dikir ku Împeratoriya Şorewî bi bê şer bê hiloşîn?

Lewra hewce ye ku giringiyek taybet bi taybetmendiyên derûnî ên dîktator bihê dan. Niha gellek ji karnasên pirsên siyasî li ser vê bawerên eku deshilata Beşar Esed ber bi rûxanê ve diçe, yek ji wan karnasan Deniis Ross e. Ew ji kesên şareza li hikumeta Obama de ye û kêfxweş e ku deshilata Esed birûxe. Ew ser vê bawerê ye jî ku ew deshilatên riya tepeseriyê bigirne pêş wê zû birûxin.

Niha emê qala du bîrûboçûnên cuda jî bikin, ku li cîranetiya Sûriyê de rû dane. Sala 1953'an Dr. Musediq serokwezîrê wê demê rewş ji bo sûrgonkirina Şahê Îranê pêk anî, û bi milyonan kesî seba vê yekê kêfxweşiya xwe eşkere kirin. Lê piştre me dît ku carek din şah vegeriya Îranê û Musediq jî li ser kar vêde da û dirêjî da deshilata xwe.

Li Havîna sala 2009'an de em şahîdê rêpîvîna bi milyonan xelkê Îranê li ser şeqaman bûn ku seba firt û fêl û dexelkariyan ku li hilbijartina serkomariya Îranê de hatibû kirin dest bi nerazîbûnek giştî kirin, herçend rejîmê xelk tepeser kir, lê xelk her hate ser şeqaman. Li Sûriyê de jî her bi vî awayî rejîm bê rehmane xelk tepeser kiriye û niha jî dike, lê xebat û tekoşîna xelkê Sûriyê her wa berdewam e. Li sala 1968'an de li Pragê de her çend di destpêkê de tepeserî bê encama mabû, lê di dawiyê de me dît ku Şorewiyê karî li vir deshilatê bi destve bigre.




Herweha hinek şoreşên rengîn ku li hinek ji welatên ser bi Şorewiya pêşîn de rû dan, di destpêkê de weha diya bû ku ew dê bikarin deshilatê biherifînin lê di dawiyê de dîsan deshilatê karî pêpkên deshilata xwe qahîm bike.

Niha di rastî de mirov nikare texmîn bike ku gelo çi qas leşker wê ji ertêşa Sûriyê cuda bin, û tepeserî heya kengê wê dewam bike, yan jî çiqas welatên derekî alîkariya opozisyonê dikin. Xelkê Îranê bi hûrî bûyerên di Sûriyê de dişopînin û heke opozisyon bi alîkariya welatên derekî bikare serkevtinan bi dest bixe, ew yek wê xelkê Îranê pirr kêfxweş bike.

**Çavkanî: Pjmedia.com**

www.arsivakurdi.org

Hejmar 174, 05'ê Çileya Paşîn 2012



# SERHILDANA AGİRÎ

A: Mecîd Cinîkanlo

Dewleta Osmanî, di Şerê Cîhan ê Yekemîn de bûn hevalbendê Dewleta Alman. Dema ku di vî şerî de dewleta Alman şikest xwar, Dewleta Osmanî lawaz ket û neteweyên herêma Balkanê, daxwaza rizgariya welatên xwe kirin û dewletên xwe ava kirin. Êdî Dewleta Osmanî ber bi belvbûnê ve diçû. Di herêma Kurdistanê de jî her ku diçû, hêza wan lawaz dibû. Dewleta Osmanî, ji bona ku vê herêmê wenda neke, digotin; "wê Kurdistan bibe Ermenîstan." Osmanîyan bi vê hîleyê xwastin ku Kurd û Ermeniyan berdin canê yektir. Eşîretên der û dora herêma Agiriyê jî, ji bo ku nedixwestin Kurdistan têkeve nav Ermenîstanê, tevî leşkerên Dewleta Osmanî bi dijî rûs û Ermeniyan şerekî mezin kirin.

Li Rûsiyê, Bolşewîk hatin ser desthilatê û leşkerên xwe ji herêma Kurdistanê vekişandin û birin. Ji bona vê sedemê, derfetekî mezin ket destê Ermenîyan. Li ser vê derfetê, Ermeniyan, êrîş kirin ser ciyên valakirî û hinek cih jî dagîr kirin. Li ser vê yekê, heta leşkerên Dewleta Osmanî hatin, êşîretên kurdan ên li hemberî ermenîya dîsa şer kirin.

**Destpêkirina şoreşê**

Bi şikestina tevgera di bin pêşengiya Şêx Seîd de, rêkxirawa Xoybûnê biryarê da ku şoreşa rizgariya Kurdistanê bidomîne. Eva bû ku navenda doza rizgariya Kurdistanê, bû Agirî.

Piştî vê ku Êhsan Nûrî û Biro qaweta xwe kirin yek, li Agirîyê gelek tiştên balkêş hatin qewimîn. Cara yekem Şoreşgerên Agirîyê cil û bergên leşkerî lixwe kirin û bi nîzamek leşkerî dest bi şer kirin, û kumên fermî yên leşkerî danîn serên xwe. Li Pêşiya kumên wan, wêneyên Agiriya mezin û biçûk û alaya kurdistanê hatibû danîn.

Êhsan nûrî ji ciwanan rêkxistina leşkerî ava kir. Der û dorên herêma agiriyê ji dijmin hatibûn valakirin, û li wan cihan ala Kurditanê bilind kirin. Di navbera salên 1926-1927an de, Biro û serokên şoreşger ên Agirî yên din, di bin gellek zehmetiyan de morala şoreşgerên Agirîyê bilind kirin. Di sala 1927'an de serokên şoreşger ên Agirîyê civîna Netewî a Kurdistanê li serê Agirîyê birêve birin. Vê civînê wezîfa rêvebirina serxwebûn û azadiyê da rêxistina xwe, û hevkarî û dostaniya bi Ermeniyan re, bi prensîb qebûl kirin. Herweha hikûmata xwe hilbijartin, her çiqas wazîfa vê Hikûmetê, çareseriya pirsgirêkên navxweyî û derekî jî bû, lê di rastî de ji bona rênîşandana şerê serxwebûn û azadîya Kurdistanê bû. Di vê civînê de, Biro Hesê Têlî bû serokê rêvebirina siyaseta berxwedana Agiriyê, û Êhsan Nûrî jî bû serokê Fermandariya Giştî a hêza Hereketa Agirîyê. Li rastî de bo yekemîn car li dewleta kurdî a agirîyê de, alaya kurdistanê hat pesend kirin û marşekî neteweyî ji bo vê dewleta kurdî hat danîn

**Destpêka Şerê Herî Mezi**

Dewleta Tûrkiyê a wê demê, di meha Hezîrana sala 1930'î de li hemberî şoreşgerên Agirîyê de, dest bi êrîşa leşkerî kirin. Di rewşekî wisa de şerê herî mezin li Agirîyê dest pêkir. Her çiqas navenda şer çiyayê Agirîyê ba jî, naveroka şer temamê herêmên Kurdistanê dabû ber xwe. Jiber ku Turkiyê dixwest bi vî şerî, di demek kin da, bê deng xwe ji şoreşgerêrên Agirîyê û ji şoreşa gelê Kurdistanê xelas bikin. Di vî şerî de lehengên Agirîyê wek şêran li hemberî hêzên Turkiyê de berxwedanî kirin, û Artêşa Turkiyê têk şikandin. Ew şer êdî bi eşkereyî kete ser rupelên rojnameyan. Ji aliyê din ve di rojname û medyaya navnetewî de jî ev mesele bû pirsgirêka Rojhelata Navîn. Li ser vê şikestê, ji nû ve deshilatdarên Turkiyê dest bi pîlanek hîn mezintir kirin, û li gora çavkaniyên Amrîkayî, wê demê 100.000 leşker û 100 balafir li şerê bi dijî şoreşa Agiriyê de bi kar anîn. Hemû hêza kurdan jî, li der û dorên Agirîyê ji 10.000 şoreşgeran derbas nedibû. Di vî şerrî de jî dîsa hêzên Tirk rastî şikestek mezin hatin.

**Tengasiya Şoreşgerên Agirîyê** Turk derûdor li şoreşgerên Agiriyê girtin û çûn û hatina wan qut kirin, û tewaya têkiliyên wan û derve û hundir birrîn. Ji bona van astengiyan, şoreşgerên Agirîyê hatin li ser çiyayê Agirîyê li hev civiyan û li ser du pirsgirêkên bingehîn sekinîn. Gengeşeya wan a yekem, li ser xwarin û vexwarinê bû. Jiber ku xwedîkirina xelkê sivîl li serê wan bibû belayekê mezin.

Pirsa duyem jî, çek û cibhexane û îmkanatên leşkerî bû. Ji bona van pirsgirêkan, şoreşgerên Agirîyê li ser du xalan sekinîn.

**1**- Êhsan Nûrî û hinek serleşkerên din digotin, "emê berê gelê sivîl xelas bikin, dawîyê emê hêza xwe derbasê cîyekî din bikin û li wê derê şer bidomînin

.**2**-biro û hin hewalên xwe jî digotin emê li wir heta dawîyê şer bikin û em xwe teslîmî Îranê nekin. Li ser vê trajedîyê şoreşgeran dev ji vê pîlanê berdan û serokê hêzên leşkerî, Êhsan Nûrî û hinek şoreşger, xelkê sivîl birne Îranê. Şoreşgerên din jî derbasî herêma Zîlan, Abaxa, û Bûlanixê bûn.

**Aqubeta Biro yê Heskê Têlî**

Di 17'yê Çiriya Pêşîn a 1930'î de, Biro û şoreşgerên digel wî, çûn ketin Agirîyê. Biro li vê derê ji nû ve serhildana şoreşgeriya Kurdistanê germ kir û şoreşgeran di her cihekê û eniyeke şer de derbe li leşkerên Turkiyê dixistinBiro yê Heskê Têlî heta, di payîza 1932'an de xwe teslîmê tu hêzên dewletan nekir û di çiyayên li ser sînorên Turkiyê û Îranê de, bi herdu dewletan re şerrên girîng kirin.

Rojekê, biro û hevjîna xwe Rebîa Xanim li ser pişta hespekî di rê de dimeşîyan, ji alîyê çend îxanetkaran ve hate gullebarankirin û şehîd bû.

Piştî şehîdbûna wî, hêzên wî yên şoreşger di bin serokatiya birayê wî Eyub de, bi neçarî çûn xwe teslîmî dewleta Îranê kirin. Bi vî awayî dawî bi serhildana netewexwazên kurd û dewleta kurdî ya agirîyê hat.

**ÊHSAN NÛRÎ PAŞA:**

Generalê Agirî Êhsan Nûrî sala 1892'an li Bedlîsê, li taxa Alî - Kolî hatiye dinê. Bedlîs yek ji bajarên Kurdistana Bakur e, bi sedsalan navenda mîraniya Şerefxanan bûye.

Êhsan Nûrî diçe serê çiya, ji bo ku hêzên kurd amade bike li dijî Tûrka şer bide destpêkirin. Îhsan Nûrî paşa dema şikesta şoreşa Agirî de dice Îranê. Ew her li Îranê, di bûyerekê de cane xwe ji dest dide.

**FERZENDE BEGÊ CALALÎ**

Ferzende Begê celalî, ji Mûşê ser bi eşîra Hesenan e. Ew mêrxas û şerkerekî çak e. Yek ji pêşewayên "Serhildana Agiriyê" ye. Di vê tevgera navbirî de navê wî, piştî Êhsan Nûrî Paşa tê.

Ferzende Begê Hesenan, beriya Tevgera Agiriyê, di sala 1925'an de beşdarî Serhildana Şêx Seîd bûbû. Piştî têkşikênandina Serhildana Şêx Seîd, Ferzende Beg ligel 150 siwariyên xwe derbasî nav sînorên Îranê dibe.

Ferzende beg û şerrwanên din li cem Simko Axayê Şikak dimînin û mil bi mile wî rêberê kurd şerrê azadîyê dikin.

li sala 1927'an de ji bo ku beşdarî li Serhildana Agiriyê bibe li simayîl axa xatirê xwe dixwaze û dizivire çîyayê agirîyê.

**Biroyê Hesê Têlî**

Biroyê Hesê Têlî, yek ji serok eşîretên Celaliyan ê ji milê Hesêsorîyan e.

Dema Biro çû serê çiya, rastî Ferzende û Çavreş hat. Ew ji bona ku di nav şerê Şoreşgerên Hereketa 1925'an de cih girtibûn, dewletê biryara dûrxistina wan jî derxistibû. Bi vî awayî her diçû qaweta Biro zêde dibû. Di dawiyê de yên ji aliyê dewletê ve hatibûn sirgûnkirin, ji ciyê xwe yê sirgûnê direviyan dehatin cem Biro.

Biro û hevalên xwe di şerrê sala 1926'an de bi serkevtin. Top û cebilxane û hinek leşker ketin destên wan de. Biro di dawîyê de wan êxsîran serbest berdide. Leşkerên Turkiyê di vî şerê yekem de şikistê dixûn.

Li ser vê bûyerê nav û dengê şoreşgerên Agirîyê li her derên Kurdistanê belv dibe. Wê demê, Ebdulqadirê sakan li Îzmîrê di sirgûnê de bû, ji cîyê xwe revîya û ji bona şer hat gihîşte Biro.

Di Sala 1927'an de Êhsan Nûrî jî, bi biryara Xoybûnê hate gehîşte Agirîyê û hêzên xwe kirin yek û Agirî kirin mîna kela şoreşgeriya Kurdistanê.

www.arsivakurdi.org

Mihemedsalih Qadirî:

# "Xelkê gund digotne me ku hûn di xema me de nebin, çi dibe, bila bibe, canê we sax û silamet be".

**Yek ji wan şerên herî giran ku li Kurdistana Îranê de rû dane, şerê Ceterê li herêma Somayê ya ser bi bajarê Urmiyê, di sala 1985'an de ye. Di vî şerî de lehengiya pêşmergên PDK Îranê bû sedem ku destanrîsiyek din jî bi destanrîsiyên pêşmergên PDKÎ ve bê zêde kirin. Bona bîranîna vî şerê giran me hevpeyvînek bi sê pêşmergeyan re pêk aniye ku bixwe beşdarên vî şerê bûne. Em hêvîdarin bi vê hevpeyvînê ku em bikarin hinek ji aliyên vî şerî bo nifşa nû ya ciwanên Kurd bidin ronî kirin.**

Hevpeyvîn: Arif Velzî


Aliyê çep: Mihemed Salih Qadirî

**Rêzdar Mihemed Salih Qadirî pêşmergê kevnar ê PDKÎ û endamê pêşîn ê Komîteya Navendiya PDKÎ yek ji beşdarên şerê Ceterê ye. Navbirî di bersiva vê pirsê de ku gelo çima şerek weha mezin rû da, bi vî awayî aliyên curbicur ên vî şerî ji me re zelal dike:**

"Di despêkê de destxeşiyê dibêjme xebatkarên Rojnameya Agirî ku bona zindî ragirtina vê destanrîsiya mezin ye ku li gundê Cetera ser bi devera Somayê ya ser bi bajarê Urmiyê de rû da.

Berî ku em basa çavaniya şerê Ceterê bikin hewce ye ku em vegerne bo wê demê, û ew şert û mercên ku şerê Ceterê têde rû da?

Sala 1363'an (1985'an a Zayînî) şer çêbû, lê di rastî de li Buhara sala 1363'yê de Komara Îslamî bi awayek berfireh û bi pîlanaka darêtî dest bi êrîşan kir û xwast ku herêmê di destê şoreşvanên kurd de derxe. Lewra di meha duyemîn û sêyemîn ya Buharê de herêm bibû qada şer.

Helwesta PDKÎ di vê demê de ew bû ku bona parastina canê hemwelatiyê xwe şerê Cibheyî, neke, belku şerê xwe yê parastina rewa li gorî xwe bi rêkxistinkirinel nû bidomîne.

Xala din ya balkêş ev bû, ku wê demê rêjîm di şereke giran di gel Îraqê de bû û di her bereyekê de ku Komara Îslamî êrîş dikire ser kurdistanê, hêza pêşmerge derbên giran li wan dixist, didan. Rejîmê bona xapandina malbatên wan kuştî û birîndaran, û bo xapandina bîrûraya giştî radigehand ku ew kesane li bereyên şerê bi dijî Îraqê de hatine kuştin.

Wê demê hêza Agirî ku pêk hatibû ji "Komîteya Ararat, Komîteya Urmiyê û hêza Şehîd Niho û desteyek ji pêşmergên hêza Şehîd Aware, biryar dan ku ji nêzîk ve serdana xelkê bikin, jiber ku rejîmê îdia dikir ku wan tewaya herêmêm Kurdistanê di destê pêşmergeyan de derxistiye.

Serdan û gera me ji hermên Mirgewer û Tirgever û geliyê Berdereşê dest pêkir, û piştî vê em çûne herêma Somayê û li geliyê Sûlê me biryar da ku li bajarê Selmas û derdorê de derbeke bihêz li hêzên Komara Îslamî bixin, jiber ku wan gellek bi bêrehmî xelk serkut dikir. Bi vî awayî li şeva 14 li ser 15'ê meha Befranbarê li nava bajarê Selmasê û li ser rêya Urmiye û Selmasê, me derbên giran li hêzên Komara Îslamî xistin.

Piştî vê ku hêzên Pêşmergeyan vegeriyane gundê Berdyanê, êrîşên hêzên rejîma Îranê dest pê kir. Lê li hemberî vê êrîşê de bi rastê pêşmergeyan destanrîsiyên kêm mînak afirandin, jiber ku serbarê vê ku bilindahiyên gund, di destê wan de bûn, lê îman û bawerî bi xwe hebûna pêşmerge bû sebeb ku hemû ceperên pasdaran di bilindahiyan de bên paqijkirin û bi deyan kes ji hêzên komara islamî hatin kuştin û birîndar kirin.

Roja 16'ê befranbarê şer li Ceterê dest pêkir. Di rastî de hêzên rejîmê ku qet xwe li hember canê xelkê sivîl de bi berpirsyar nizanin û yasa û pirensîpên ku di şer de jî hene qet naparêzin, li hember hemwelatiyên xwe de ku xelkê kurd yê Ceterê bûn, dest bi topbarana gund kir, bi awayekê ku di deqeyekê de bi deyan top, xompare, arpîcî û katyoşa di nav gun didan, wê demê zivistan bû, lê ew qas top û xompare li gund û derdora gund li erdê ketibûn ku befra sipî di nava teqîna topan de reş bibû".

**Birêz Mihemedsalih Qadirî derbarê derbarê morala gundiyan û ew desteka ku gundiyan didane wan, weha dibêje:**

"Serbarê vê rewşê, seba vê ku hêzên rejîmê digotin ku me PDK Îranê ji nav biriye, lê gundiyan didît ku ew gotinên wan ne rast in, û dîsan



pêşmerge bihêz wek carên pêşîn, di nav kûrahiya axa kurdistanê û di qelbê dujmin de û di navbere du bajarên stratijîke Urmiye û Selmasê de,kariye rejîmê weha têk bişkêne pirr kêfxweş bûn.

**Hewceyê basê ye ku di rewşek dijwar ya bi vî awayî de jî, xelkê gund digotne me ku hûn di xma me de nebin, çi dibe, bila bibe, şert hûn in, bila canê we sax û silamet be.**

Di rastî de serbarê vê êrîşa herî mezin a hêzên rejîmê ew jî bi wan hemû îmkanatên şer, lê berxwedana pêşmerge û xelkê gundê Ceterê bû sebeb ku heya êvarê sê caran hêzên rêjîmê têk bişkên. Heke ez şaş nebim mixabin ji bil wan hemû zirarên din yên malî, gundiyek jî şehîd û yek jî birîndar ket.

Ew derba ku di şerê Ceterê de li rejîmê ket ew qas giran bû ku vê carê berevajyê carên pêşîn nekarî kuştiyên xwe veşêre yan jî wek kuştiyên li eniyên şerê bi dijî Îraqê de bide zanîn, belku neçar ma ku di nûçeyên radyoyî de bas ji şerê Ceterê û kuştiyên xwe ên di vî şerî de bike.

Lewra ew berxwedaniya mezin ya hêzên pêşmerge bi piştevanî û alîkariya xelkê Kurdistanê divêt bo heta heta nehê jibîr kirin. Jiber ku wan bi dijmin selmand ku qet serê xwe li hemberî dagîrkeran de natevînin û dê xebat heya serkevtina yekcarî wê berdewam be".

**Beşdarek din yê şerê Ceterê birêz Mistefa Îbrahîmzade naskirî bi Mistefa Caşêranî ye. Navbirî ji bi vîawayî ji me re bas ji destpêkirina şerê Ceterê dike:**

"Hindî ez bizanim tu agehdarî me tunebûn ku şer dê çêbe, û hêzên rejîma komara îslamî di rê de ne. Gotin îşev û sibê em dê li nava gundê Ceterê de bimînin û dusbe emê herin.

Di nav malan de em dabeş bûn, bere berê şefeqê ez û Hesen Bazûke yê ser bi hêza Hatem, em nobedar bûn ku ji nişkêve me dît ku hêzeke rejîmê êrîş anî ser me. Piştî vê ku me xwe bi başî amade kir, me karî li hember êrîşê de bi lehengiyek baş ve ber xwe bidin, û derbên giran li wan bixin".

**Navbirî derbarê hijmara pêşmergeyên beşdar di şer de û jimara şehîd û bîndarên pêşmerge jî dibêje:**

"Di rastî de vê rojê şehîd Feqo gote min ku 110 kes dê biçin ceterê û beşdarî şer bibin, ku ser bi hêzên şehîdan Niho, Avare, Sergurd Ebbasî, û Hatem bûn, û herweha 8 kasên Mucahidînan jî di nav gundê ceterê de bûn. Di vî şerî de me 13 şehîd û pitir ji sî birîndarî hebûn".

Pêşmergê qehrenane PDKÎ rêzdar Mistefa Caşîranî serkevtina pêşmergeyên PDKÎ do vî şerê giran de wek xweştirîn bîreweriya xwe dizane.

**birêz Fethulla Xûbayî jî pêşmergeyek din ê qehreman yê di şerê Ceterê ye. Fethulla Xubayî di bersiva vê pirsê de ku gelo Komara Îslamî di şerê Ceterê de çima weha şikist xar, bi vî away bersiva me dide:**



Fethulla Xûbayî



Mistefa Caşêranî

"Biryar nebû ku em şer bikin, lê serbarê vê ku nebûna fîşekan em nîgeran kiribûn, hêzên rejîma Îranê êrîşî ser me kirin. Bi xweşî ve hêza pêşmerge bernameyeke baş danandin û gotin heya hêzêzn komara îslamî negîjne nava gond, em lê nedin. Hêzên rejîmê hatin û heta ji hêza pêşmerge jî derbas bûn.

Di vê demê de bû şer dest pêkir, û di rastî de hêzên rejîmê derbên dijwar xwarin, û ew çek û teqemeniyên ku digel xwe anîbûn, hemû weke deskevt di meydana şer de bi cih man, û ketin destê pêşmerge de.

Dijmin paşve vekişiya û piştî heyamekê çendîn êrîşên curbicur, û bi piştevaniya topxaneyan kirne ser hêzên me, lê di encama berxwedaniya hêzên me de ew bi kuştî û birîndarên zaf ve vedigeriyan, û deskevtên xwe jî me bi awayên curbicur diveşartin.

Piştî her têkçûneke dijmin û paşve vekişyana wan, dijmin bi tundî cihê şer bi undî topbaran dikir, û di heyamê deqeyekê de pitir ji deyan goulle topan li erdê diket, bi awayekê ku êdî me hajê dengê çekên sivik ên xwe veke keleşînkofan nedibû û nedibihîst, û em wek mirovên ker lê hatibûn, topbaran bi qasekî dijvar bû ku xelkê herêma Somayê gotibûn ku tu kes di gond de rizgar nabe û hemû dê bên kuştin.

Dujmin bi ev hêza xwe ya mezin û pir çek hatibû ku hêza pêşmerge di herêmê de bi giştî ji nav bibe û nehêle ku kes rizgar bibe, lê pêşmergên PDKÎ sê şev û sê rojan bê ravestan di nava befr û sir û seqema Zivistanê di hêza dujmin bi tevahî têk şikandin û êdî dijmin nekarî roja çarê êrîşî ser pêşmergeyan bike.

Wê demê xelkê herêma Somayê digotin ku di dema birina ciwanên Kurd bo leşkeriyê (serbaziyê) , hêzên rejîma Îranê li gund û bajaran digeriyan û digotin her kes rojekê jî di şerê Ceterê de beşdar be, êdî em leşkeriyê bi wî nadin kirin û wê bi yekcarî karta bidawîanîna leşkeriyê werigire.

Di vî şerê giran de herçend pêşmergeyan nekarîn termê şehîdên xwe bibin, lê zêdetir ji sî birîndarî hebûn ku yek ji wan ez bixwe bûm ku ser bi Hêza Şehîd Niho bûm, ku em her sî birîndar jî ji aliyê pêşmergeyan ve hatin rizgar kirin".

**Birêz Fethulla herweha di bersiva vê pirsê de ku gelo kuştî û birîndarên rejîma Îranê çiqas bûn weha dibêje:**

"Şeva yekemîn di şerê Selmasê de nezîkî 40 kes bûne qurbaniyê siyasetên şaş yên deshelatdarên rejîma Îranê û di şerê gondê Berdyanê de jî gellek çek û teqemenî û belgeyên hewce ketin destê pêşmergeyan de.

Di şerê Ceterê de bi hezaran sîlahên curbicur weke bîkîsî û arpîcî û bi sedan belgeyên pêwendîdar bi karûbarê leşkerî û îtilaatîê ketin destê hêza pêşmerge de. Bi vî awayî derbeke giran li Komara Îslamî ya Îranê ket û pitir ji 1000 kuştî û birîndar bûne qurbaniyê siyasetên dijî mirovî ên deshelatdarên rejîmê".




# Zimanê kurdî mîrata bav û kalên me



Bêhzad Simko

Zimanê Kurdî nîşana hebûna netewa Kurd e, Xwedî derketin ji ziman tenê bi teorî û gotinan nabe, belku pêwistî bi zanista ziman nasî heye.

Îro zimanê Kurdî ji gellek aliyan ve pêş dikeve, û ciwaniyên zimanê kurdî tên dîtin. Wergirtina peyvan ji zimanên din ve, dibe sebebê pêşveçûn û dewlemendtirbûna vî zimanî.

Çapemenî û binkeyên ronakbîrî û ragehandinê yên Kurdî di nav her çar aliyên Kurdistanê de gerek bi şarezayî û bi hûrbîbîniyek zaf di nav komek bêjeyan de, parêzvanî ji zimanê kurdî bikin û nehêlin bêjeyên nedurust û şaşiyên nivîsê di nav de belav bibin, û ji paşeroja zimanê kurdî ra bibin sedemên lawaz bûna ziman û rêzimanê kurdî. Pêwîst e kesek ku di karê ziman de dixebite, şarezayiyek tam ji rêziman û nivîsa kurdî hebe.

Heke kesek bêyî vê taybetmendiyê dest bi nivîsa Kurdî bike bo zimanê kurdî dibe ku pirsgirêkên cur bi cur bîne pêş.

Îro tê dîtin ku di nav ragehandinên TV, radiyo û çapemeniyan de ev lawazî tên dîtin û ya pir xirab ew e ku her tim ew şaşî tên dubare kirin û çend bare kirin jî.

Bîra me neçe ku zimanê kurdî tenê bo îro nayê bikar anîn, belku di paşeroja kurdistanê de, wê pitir bikar bihêt, lewra divêt em îro rast nivîsîn û giramêra Kurdî bi başî biparêzin û derfet nedin bi neşarezayan ta ku zimanê kurdî lawaz û xirab bikin.

Celadet Bedirxan rênivîsa kurdî bi ronî û pirr bi başî raxistiye ber çavan. Lewra hewce ye ku em li gorî kar û xebata navbirî li ser zimanê Kurdî bisekinin û şaşiyan serrast bikin.

Îro rênivîsa zimanê kurdî mixabin seba neşarezayîya hinek bi nav zimanzanan ve tûşî hinek aloziyan dibe. Di rastî de heke em ser bifikirin ku zimanê kurdî ji çi qonaxan û ji çi bagerên dujminên Kurdistanê derbas bûye, û gelê kurd çi bedelên giran dane ku ta îro zimanê Kurdî bê parastin, wê demê emê bi hestyariyek zêdetir û bi hewladanek zêdetir û bi hûrbîniyek zêdetir ve kar bo parastina wî zimanî girîng bikin.

Partiyên Kurdistanî jî ku pitira wan alfabê a Latîn bikar tînin, divêt gellek hişyar bin ku ew ziman bi şaşî neyê bikar anîn û tewaya aliyên wê yên geramêr û rênûsî di nivîsên wan de bi durustî bêne parastin, da ku derfeta şaş bikaranîna zimanê Kurdî bi tu kesî nehê dan.

Helbestvan û hozanvanên Kurd, bi bikaranîna bêje û peyvên resen yên kurdî dikarin rê vekin bo kesên din ku ziman dewlementir bikin, lê eva ku îro herkes bikare kurdî binivîse û bixwîne, nabe bibe sedema vê ku hemû ew kesane wek şarezayên ziman werin naskirin, belku zimanê me pirr dewlemend e û hewcehî bi kar û xebatek zaf heye bona bidestveanîna şarezayiyek zaf di vî zimanî de.

Îro çeka di destê Kurdan de pênûs e, û hewce ye ku ew çek bihêz be, ta ku Kurd bikarin di her qadekê de serkevtinê bidest bixin.

# *Kulîlkên Bihara Roboskî*



Mahabad Felat Arda

***Sîh û pênc hêvî me, sîh û pênc berfîn mizgîniya biharê û dîmenek ji kulîlkên Roboskî***

***Sîh û pênc caran zarok im***

***rengê xiyalan***

***Sîh û pênc caran xort***

***dengê hêviyan***

***Sîh û pênc hêvî me, sîh û pênc berfîn***

***mizgîniya biharê***

***û dîmenek ji kulîlkên Roboskî***

***Sîh û pênc caran jiyan im***

***li ser laşên parçebûyî***

***Sîh û pênc caran kurd im***

***xewnereşka şevşevokan***

***Sîh û pênc nefes***

***di rengê Xuda de ku***

***jiyan dide***

***nûşîn dike***

***Sîh û pênc hêstir im***

***ji hêrsa di gewriyan de derdayî***

***Sîh û pênc qêrîn im***

***li ser zimanê milyonan***

***û kute kuta dilê xwînmijan***

***Sîh û pênc keser im***

***hêviya pêşeroja azad***

***Û "dara azadiyê bi xwîn û xwêdan tê avdan"***

www.arsivakurdi.org

# Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE


E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com




## Rejîma Îranê di her 48 demjimêran de kolberekê dikuje, yan birîndar dike



Li gorî nûçeyan, di navbera sê mehan de, 48 kes ji kolberên sînorî ên

**Kurdistana Îranê ketine ber destrêjiya rasterast a hêzên leşkerî yên Îranê û hatine kuştin yan birîndarkirin.**

Ji wan 48 kesan, 28 kesan canê xwe ji dest dane û 20 kesên din jî birîndar bûne. Seba nebûna derfetên karî û rewşa nebaş a aborî li Rojhilatê Kurdistanê, bi taybetî deverên sînorî, akinciyên wan deveran bi neçarî ji bo hewcehiyên bijîva jiyanê rû li karê pir zehmet yê kolberiyê dikin.

## Di sala 2011'an de gellek ji kesayetên navdar daxwaza lêborînê ji xelkê kirin, bo mînak:



**Pap "Binidîktê Şanzdehem":** Navbirî amaje bi tund û tûjiyên ku di dirêjahiya dîrokê de bo teblîxa ola Mesîhê hatine encamdan kir û got: "Em piştrast dikin ku ew kiriyarên bişerm hatine encamdan. Lê gellek xuya ye ku ew kiriyar mifahstandina nerewa ji hest û îmana Mesîhiyetê bûye û li dijî esliyeta Mesîhiyetê ye".



**Hîlarî Suwang:** Ektera fîlmên "Kur nagrîn" û "Keça Milyon dolarî" derheq amadebûn di rê û resma jidayîkbûna "Remezan Qedîrof", rêberê Çiçinê, daxwaza lêborînê kir û got: "Ez bi rastî ji vê kiriyara xwe poşman im".



**Arnold Şuartznigêr**: Di destpêka meha Gulanê de, Mariya Şiraywêr, hevjîna Arnold, piştî 25 salan seba pêwendiya Arnold bi jinek din re xwaziyarê wergirtina telaqê bû. Arnold di vê derheqê de got: "Ez vê rewşê fêm dikim û xwe bi tawanbar û berpirs dizanim û min tu pasavek di vê derheqê de tune ye".



**Can Galiyano:** Vidiyoyek ji Can Galiyano di nav Youtubê hatibû bilavkirin ku navbirî di vê vîdioyê de gotibû ez ji Hîtlêrê hez dikim. Navbirî di vê derheqê de daxwaza lêborînê kir û got: "Dijberî li gel Yehûdiyan û regezperestî di civaka me de tu cihek tune ye û ez seba riftara xwe ku bû sedema nerehetiya xelkê, daxwaza lêborînê dikim".



**Mistefa Taczade:** Mistefa Taczade, çalakê siyasî ê Rîformxwazê Îranî ku niha di zîndanê de ye, di yek ji nameyên xwe de seba hin ji karên hevçeperên xwe ku berê encam da bûn, daxwaza lêborîn ji xelkê kir, navbirî herweha nivîsandibû: "Xetayê me eve bû ku li hember hin riftarên dadgeha Şoreşê a rejîmê de me helwest negirtin".



**Şiys Rezayî:** Şiys Rezayî, Fotballîstê Pirspolîsê, bi bilavkirina nameyekê daxwaza lêborînê ji kiriyara xwe piştî lêdana golek bi tîma "Damaşa Gîlan" kir.

**Fereculla Selehşûr:** Fereculla Selehşûr, derhênerê Îranî, piştî gotinên xwe di warê sînemaya Îranê ku wê bi "Fahişexane" şibandibû, got ku axaftina min bi awayekî xirab hatiye ragihandin.

## 20 ton zêr û 80 milyon Euro'yên Qezafî hatin dîtin



**20 ton zêr û 80 milyon Euro'ên Qezafî ku li çolekê li bajarê Zale ku dikeve başûrê Lîbiyê de hatibûn veşartin, hate dîtin.**

Dewleta Firansayê dibêje ku renge Qezafî 85 milyard Euro'yî hebin, lê berpirsên dewleta niha ya Lîbîyê ser vê bawerê ne ku perê Qezafî li dora 200 milyard Euro'yî jî dibe.

## Ew spora ku ji jinan re qedexe kirin



**Jin di Îranê de ji rişteyên sporê ên rîngî "kîkboksîng" û "moytay", ku tevî çanda Îslamî a Komara Îslamiya Îranê hevaheng nînin, hatin qedexekirin.**

Merziye Ekberabadî, Cihgirê seroka spora Jinan di Wezareta Werziş û Ciwanan de, got: Di nava rişteyên Rîngî de, tenê "Kîkboksîng" û "Moytay" di Îranê de çalak bûn ku çalakiyên jinan di wan du rişteyan de hatiye qedexekirin.

Wê sedemên qedexekirina wan werzişan hevahengnebûn wan sporan tev îslamê û herweha tund û tûj bûna wan ku ji jinan re metirsîdar e da zanîn.

Jinên werzişvan di Îranê de berbirûyê zaf pirsgirêkan bûne û kincên ku ew bi neçarî ji bo werzişê li xwe dikin, asta şiyanên wan ên werzişî kêm kiriye.

Gellek caran jinên Îranê seba mifahsitandin ji kincên werzişî ên ne standard ên cîhanî, di qada werzişê de tûşî qedexekirinên nexwastî bûne.

